Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :425 nameronahi@gmail.com 2- Tebax - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# 58 ciwan beşdarî YPG`ê bûn



**Li Akademiya Şehîd Xebat a YPG`ê 58 ciwanên ji Hesekê ku dewreya perwerdeyê bi dawî kirin, tevlî nava refên YPG`ê bûn.**
**Dewreya perwerdeyê ku navê Şehîd Ziyed, lê hatibû kirin, 45 rojan berdewam kir. Di perwerdeyê de, dersên bîrdozî û leşkerî hatin dayîn.**
**Bi armanca qedandina dewreyê merasîmek hate lidarxistin.**
**Hejmarek şervan û fermandarên YPG`ê, Hêzên Asayîşê, şêniyên Hesekê û malbatên şehîdan beşdarî merasîmê bûn.**
**Di merasîmê de yek ji fermandarên YPG`ê Delîl Şoreş qedandina dewreyê li endaman pîroz kir û got ku parastina welat erkeke ji her kesî tê xwestin û pêwîste endamên perwerdeyê li dijî her êrîşên ku werin kirin amade bin.**



**Di dawiya merasîmê de, şervanan sonda leşkerî xwarin û beşdarî nava refên YPG'ê bûn.**





# Giyayên zozanan tehma penêr xweş dike





Yek ji xwarinên herî giranbiha yên Wanê penêrê bi giyaye. Ji bo penêr xera nebe û çêj bikevê bi kûpan di bin erdê de vedişêrin. Jinên zozanî diyar kirin ku ew penêr bi şîrê miyan çêdikin û tehma xwe ji giyayê xwezayî yên zozanan distîne.



Li Wanê tişta herî bi nav û deng yêk jê taştêya wê ye. Tişta ku taştêyê dixemilîne jî penêrê bi giya yên zozanan e. Zozaniyên li taxa Qardoxan a navçeya Erdîşa Wanê ji şîrê teze yên miyan penêr çêdikin. Jinan dest bi çêkirina penêrê giya jî kir. Penêrê tê çêkirin ewil dixin kûpan û ji bo xera nebe û çêja xwe bigire di bin erdê de vedişêrin.



Penêr heta mehên zivistanê di bin erdê de tê hiştin û pişt re derdixin.

Li gel penêr, keşk, nivişk, toraq û lorik jî tên çêkirin û jin di kûpan de vedêşirin.

**SÎRIK TEHMÊ DIDE PENÊR**

Ji van jinan Sabîha Kirmizi diyar kir ku ji bo amadekariyên zivistanê penêr û rûn çêdikin û penêrê çêdikin tehma xwe ji sîrika dixin navê digire. Kirmizi anî ziman ku karê çêkirina penêr yek ji karê herî giran e û eziyeta vî karî jî jin dikişînin.

**JI AVA PENÊR HILBERÎNÊN DIN JÎ ÇÊDIKIN**

Sozdar Kirmizi jî destnîşan kir ku ew ewil girîngiya didin çêkirina penêr û keşkê û got: "Ewil em pênêr çêdikin, ava li pişt dimîne jî em jê hilberînên din çêdikin. Ava ji penêr dimîne em di tenûrê de dikelînin. Pişt re dibe toraq. Heta hefteyekê em vê toraqê ziwa dikin. Pişt re jî keşke jê derdikeve. Pêwîste em keşkê teqez bixin kîsên meles û biparêzin. Heta zivistanê em keşke vedêşêrin. Em di xwarina bi nav û deng keledoş a Wanê de bikar tînin. Keşke bi tenê jî tê xwarin."

**BI GIYAYÊN XWEZAYÎ ÇÊDIKIN**


Faîle Saglam jî da zanîn ku ew giyayê li nav penêr dixin ên mîna heliz, sîrik, qaşim, mende di mehên biharê de li zozanan berhev dikin. Saglam behsa çêkirina penêrê xwe kir û got penêrê ew çêdikin bi piranî ew dixwin û yê mayî jî difiroşin. Saglam got ew penêrê xwe bi giyayê xwezayî yên zozanan çêdikin.

**TEHMA WÊ JI ZOZANAN E**

Saglam anî ziman ku tehma penêrê wan ji zozanan tê û got: "Em miyên xwe li zozanan xwedî dikin û ji şîrê wan penêr çêdikin. Tehma mezin ji giya digire. Penêrê me hemû organîk e."...*MA*

Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 425 2 - Tebax- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## 5 leşkerên Tirk hatin kuştin



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê diyar kir ku hêzên wan çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Delal Amed û Şehîdên Bestayê de li navçeya Berwarî ya Sêrtê li yekîneyên artêşa Tirk ên derketin operasyonê xistin. Hate gotin, di vê 'pêngava şoreşgerî' de 5 leşkerên Tirk hatine kuştin.*R-2*

# BÎLANÇOYA WEHŞETA DAGIRKERIYÊ



## TALAN Û REVANDIN DI ASTA JOR DE YE

Zilm, hovîtî, wehşet û hemû kiryarên dij mirovahahî yên dagirkeriya dewleta Tirk li Efrînê li pêş çavên hemû cîhanê berdewam dikin. Dagirkeran li Efrînê avêtin ser mala Mehmûd Osiko ew birîndar kirin û dest danîn ser alavên wî. Her wiha sûka gel dorpêç kirin û sê kes revandin. Dagirkeran li gundê Kerkê yê Mabata jî ciwanekî bi navê Rifet Mûrad revandin û birin xistin girtîgeheke Tirkiyê. *R-2*

## KIRYARÊN HOVANE DEWAM DIKIN

Rêxistinên mafê mirovan ku hovîtiya Tirkiyê bi belge dikin, bang li civaka navdewletî dikin ku kiryarên xwe yên hovane rawestîne. Lê heta niha ji ber bê dengiya cîhanê ya li hember vê zilma Tirkiyê, ev kiryar derketine asta herî jor. Pştî ku Efîn hat dagirkirin û pêde 22 kesên sivîl windane, 25 hatine qetilkirin, 35 kes hatine girtin, 4 kes hatine birîndar kirin û 180 kes jî hatine revandin. *R-5*

## Em ê li ber fermanan serî netewînin



Hevseroka Yekîtiya Êzidiyên Herêma Efrînê Suad Hiso salvegera 4'emîn a Komkujiya Şengalê bi bîr anî û diyar kir ku fermana 74'an a ku hat serê Êzidiyan ji êrîşên li ser Êzidiyên li Efrînê ne cuda ye û got, "Em ê li dijî fermanan tu carî serî netewînin û li berxwe bidin." *R-3*

## Êrîşa li ser Şengalê li dijî jinan pêk hat

Çalakvana Tevgera Jinên Azad TJA Ayşe Gokkan, diyar kir ku êrîşa DAÎŞ'ê ya di 3'yê Tebaxa 2014'an de li dijî Şengalê pêk hat, li hemberî berxwedana jinan pêk hat û got: "Êrîş û polîtîkayên 5 hezar sal ên li ser jinan, bi fermana 73'yemîn a li ser gelê Êzidî, carek din hat dubarekirin." *R-5*

## Konferansa Kongreya Star de biryarên girîng




1.Konferansa Rêxistina Kongreya Star a Qamişlo ku bi duruşmeya "Bi rihê Berxwedana Serdemê em şoreşa jin veguherînin şoreşa civakî" di 31'ê Tîrmehê de li bajarê Qamişlo hat lidarxistin bi biryarên girîng bi dawî bû. Di konferansê de plansaziya du salên pêş hat derxistin û koordînasyoneke nû hat hilbijartin. *R-3*

## Ji bo Şengalê li 20 navendan wê meş bên kirin

Hevserokên NAV-DEM'ê daxuyaniyek da diyar kir ku ji bo salvegera êrîşên çeteyên DAÎŞ'ê yên 3'ê Tebaxa 2014'an li ser Şengalê wê li 20 bajarên Ewropayê çalakiyên protestoyî werin lidarxistin û banga tevlêbûna çalakiyan kir. NAV-DEM'ê di daxuyaniyê de got, "Ev komkujî ne tenê li dijî Êzidiyan hatiye kirin. Komkujî li dijî mirovahiyê hatiye kirin." *R-5*




## Artêşa Tirk li hember gerîla têk çûye




Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Mûrad Karayilan ji yekîneyên gerîla re axivî û diyar kir ku artêşa Tirk li hember şerê gêrîla têk çuye lewma êdî tenê teknîka hewayî bikartîne. Karayilan wiha got, "Dewleta Tirk piştî ku dît di şer de têk çûye, ji Îlona 2016'an û pê ve biryar da ku şer êdî bi amûrên hewayî bidomîne." *R-4*

## Azadiya Ocalan azadiya gelan e



Endamê Desteya Rêveber a Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD'ê Esed Menan tecrîda girankirî ya li ser Rêberê gelê Kurd Abdulah Ocalan weke tecrîda li ser tevahî gelê Kurd pênase kir û got, "Rêber Ocalan bi berxwedan û têkoşîna xwe hemû planên hêzên komploger vala derxist." *R-4*

## Dema wê were wê leşkerên Tirk derkevin



Nûnerê Taybet ê Serokê Dewleta Rûsyayê Vladîmîr Pûtîn ê Sûriyê Aleksandr Lavrentyev diyar kir ku, 'dema ku wexta wê hat' ew ê israr bikin ku bila leşkerên Tirk ji Sûriyê derkevin. Lavrengtyev got, "Herêmêke gelek fireh a Sûriyê di bin kontrola Tirkiyê de ye. Ji bo sivîl bi awayekî ewle karibin li vê deran bijîn, em ê israr bikin ku leşkerên Tirk ji van deran derkevin." *R-2*

# Li Efrînê talan û êşkence dewam dike



*Zilm, hovîtî, wehşet û hemû kiryarên dij mirovahahî yên dagirkeriya dewleta Tirk li Efrînê li pêş çavên hemû cîhanê berdewam dikin. Çete û leşkerên dagirker her roj davêjin ser malên welatiyan, wan direvînin û dest datînin ser mal û milkên wan.*

Hêzên Tirk ên dagirker avêtin ser mala welatiyekî Efrînê yê bi navê Mehmûd Osiko, ew birîndar kirin û dest danîn ser alavên wî.
Êrîş şeva Sêşemê hate kirin. Li gorî çavkaniyên herêmî, komên çete yên li navenda bajêr avêtin ser mala kesê bi navê Mehmûd Osiko. Dagirkeran êşkence li xwediyê malê kirin û dest danîn ser alavên wî.
Dema ku Osiko li ber dagirkeran rabû, çeteyên Tirk ên dagirker kêr li wî dan û ew birîndar kirin.

### SÛK DORPÊÇ KIRIN SÊ KES REVANDIN

Sûka gel a li Efrînê ya di bin dagirkeriya dewleta Tirk de, ji hêla çeteyan ve dora wê hate pêçan û 3 kes hatin revandin.
Li gorî agahiyên xwecih çeteyên bi ser dewleta tirk de bi ser sûka gel de girtin, sûk dorpêç kirin.
Hate gotin çeteyan 3 kes ji sûkê revandine û heta danê nîvro hê jî ev dorpêça çeteyan didome.
Li Efrînê ku ji hêla dewleta Tirk û çeteyên wan ve hatiye dagirkirin, her roj agahiyên li ser êşkence, tecawiz, talan û înfazê tên.

### DAGIRKERAN SIVÎLEKÎ DIN REVANDIN

Hêzên Tirk ên dagirker li EFrînê kesekî bi navê Rifet Murad revandin.
Li gorî agahiyan artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wan ciwanê 26 salî yê bi navê Rifet Mirad ku li Efrînê li dikanekê dixebitî, revandin.
Jêderên xwecih gotin Rifet Murad ê bi nifûsa gundê Kerkê ya navçeya Mabatê birin girtîgeheke li Tirkiyê.

## Li Berwariyê 5 leşker hatin kuştin



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê diyar kir ku hêzên wan li navçeya Berwarî ya Sêrtê li yekîneyên artêşa Tirk ên derketin operasyonê xistin. Hate gotin, di vê 'pêngava şoreşgerî' de 5 leşkerên Tirk hatine kuştin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiyên vê dawiyê yên gerîla daxuyaniyeke nivîskî weşand û ev agahî da:
"Artêşa TC a dagirker roja 25'ê Tîrmehê li herêma Çemê Karê ya navçeya Berwarî ya Sêrtê dest bi operasyoneke berfireh kir. Operasyon hîn jî dewam dike. Hêzên me li dijî yekîneyên dijmin ên derketin operasyonê çalakî pêk anîn. Çalakî di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Delal Amed û Şehîdên Bestayê de hatin kirin.
29'ê Tîrmehê saet 15'an li dijî leşkerên dijmin ên li ser girê Şehîd Sorxwîn, gerîlayên me yên YJA Starê çalakiyek li dar xistin. Derbên giran li leşkerên dijmin ên li ser gir hatin xistin û di çalakiyê de 3 leşker hatin kuştin.
Gerîlayên me yên YJA Starê roja 30'ê Tîrmehê saet 17:30'î li leşkerên li ser girê Şehîd Sorxwîn xistin. Derbên giran li çeperên dijmin hatin xistin û leşkerek hate kuştin.
Hêzên me di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de, 31'ê Tîrmehê saet 21:30'î li dijî artêşa TC a dagirker a li mintiqeya Deriyê Pêşmerga ya li herêma Govendê ya navçeya Şemzînan a Colemêrgê çalakiyek pêk anîn. Di çalakiyê de leşkerek hate kuştin.

## Li Îranê çalakiyên gel berbelav dibin




Li Îranê çalakiyên gel yên li dijî rewşa giran a jiyanê, nelirêtî, qutbûna av û ceyranê belavî navenda welat Îsfahan û gelek bajarên din bû.
Li Îsfahanê çalakger li dijî rewşa giran a jiyanê û qutbûna av û ceyranê daketin kolanan.
Çalakî ji aliyê esnafên bajar ve hate destpêkirin û şofêrên qemyonan ên di grevê de jî piştgirî dan çalakiyan. Şofêrên qeymonan ev hefteyek e di grevê de ne. Ji roja înê ya derbasbûyî ve li 30 eyaletan û 112 bajaran şofêrên qeymonan di grevê de bûn. Agahiyên nû yên têkildarî grevê nehatin bidestxistin Çalakiyên prostestoyê belavî bajarên din jî bûn. Li bajarê Şast yê dikeve bakurê welat jî çalakiyên protestoyê hatin lidarxistin. Di çalakiyan de dirûşmeya 'Bi van nelirêtiyan wê Îran tu caran negihe silametiyê û wê azad nebe." Hatin avêtin.
Li bajarê Ahvaz yê dikeve başûr rojavayê welat perwerdekaran jî çalakiyek mezin li dar xistin. Çalakgerên ji tevahiya eyaleta Hûzîstan hatin li ber navenda perwerdehiya eyaletê li hev civiyan û daxwaza mûçeyên bilind kirin. Karkerên Gara Zencanê jî roja Sêşemê çalakiyek li dar xist û daxwaza mûçeyên xwe kirin. Karkeran gotin ev 4 meh e mûçe wernagirin û 12 meh in ewlehiya teqawidbûnê wernegirtine.
Karkerên rêya trenê û hempîşeyên wan li bajarên Tebrîz, Şahrûd, Damkan, Semnan, Lorîstan, Andîmeş û Îslamşehir çalakiyên protestoyê li dar xistin û dest bi grevan kirin.

## Netewên Yekbûyî çavên xwe li Efrînê digire

Netewên Yekbûyî diyar kir ku da nava 6 mehên îsal de mîlyonek û 2 hezar di hundirê Sûriyê de koçber bûne û destnîşan kir ku hejmara herî zêde ya koçberan li Idlibê bû. NY'yê di heman demê de behsa koçberiya welatiyên Efrînê ji ber dagirkeriya Tirkiyê nekir.
Netewên Yekbûyî careke din ji ber agahiyên berdewama pêlên koçberiya li herêmên Sûriyê xemgîniya xwe anî ziman û wiha got: "Li gorî raporan di 6 mehên îsal de nêzî 1.2 milyon kes di hundirê Sûriyê de pêrîşan bûne, ango rojane 6500 kes."
Ji Buroya Berdevkê Netewên Yekbûyî Arî Konîko diyar kir ku hejmara herî zêde ya pêlên koçberiya hundirîn di sê mehên destpêka îsal de li Idlibê pêk hat. Her wiha bal kişand ku çalakiyên leşkerî yên rêjîmê hişt ku nêzî 400 hezar kes koçber bibin.
Her wiha mezintirîn pêla koçberiyê di van demên dawî li Deraayê pêk hat dema ku çalakiyên leşkerî hişt ku bêtirî 300 hezar kes ji malên xwe koçber bibin.
Di rapora Netewên Yekbûyî de behsa sedhezaran welatiyên Efrînê ku ji ber hovîtiya dagirkeriya Tirkiyê koçber bûne ku di 20'ê çileya îsal de dest pê kiriye, nehatiye kirin.
Di çarçoveya êrîşa dagirkeriya Tirkiyê de li dijî herêma Efrînê bêtirî 300 welatiyên sivîl şehîd bûn û bi sedan birîndar bûn. Êrîşa dagirkeriya Tirkiyê her wiha li dijî deverên dîrokî û şûnwarên Efrînê pêk hat û di encamê de bi sedhezaran welatiyên Efrînê neçar bûn ku ber bi herêma Şehba ve koçber bibin.



## Şervanekî YPG'ê di Çemê Firatê de şehîd bû



Şervanê YPG'ê Merwan Kobanê (Mihemed Ebûd) li herêma Reqayê dema di Çemê Firatê de avjenî dikir, jiyana xwe ji dest da.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya YPG'ê daxuyaniyeke nivîskî weşand û got, "Hevalê me Merwan Kobanê ku 28'ê Tîrmehê ji Eyn Îsa ji bo betlaneyê çû Reqayê, roja 29'ê Tîrmehê dema di Çemê Firatê de avjenî dikir fetisî û şehîd bû."
Di daxuyaniya YPG'ê de hate gotin, "Di şexsê hevrêyê me Merwan de em hemû şehîdên xwe yên leheng bi rêzdarî bi bîr tînin û careke din soz didin ku em ê dilsozê bîranîna şehîdan bin û têkoşînê bi ser bixînin."

## Dema wê were wê leşkerên Tirk derkevin

Nûnerê Taybet ê Serokê Dewleta Rûsyayê Vladîmîr Pûtîn ê Sûriyê Aleksandr Lavrentyev diyar kir ku, 'dema ku wexta wê hat' ew ê israr bikin ku bila leşkerên Tirk ji Sûriyê derkevin.
Tê payîn ku di Îlona bê de Tirkiye têkildarî dahatûya Sûriyê bi beşdariya Elmanya, Fransa û Rûsyayê 'Civîneke Sûriyê' li dar bixe. Di vê pêvajoyê de Nûnerê Taybet ê Serokê Dewleta Rûsyayê Vladîmîr Pûtîn ê Sûriyeyê Aleksandr Lavrentyev têkildarî Tirkiyê daxuyaniyeke balkêş da.
Nûnerê taybet ê Rûsyayê Lavrentyev ji ajansa Rûs re axivî û ev tişt got:
"Heke em werin ser meseleya herêmên ku ji aliyê leşkerên Tirk ve tên kontrolkirin, ev der di navbera Ezaz û Cerablûsê de ye û qadeke gelekî mezin e. Ji bo ku li Îdlîbê pergalek were avakirin, Tirkiyê xwe xist binê hin berpirsyariyan. Me her dem got, piştî ku operasyonên wan ên li vê derê û peywira wan qediya, divê leşkerên Tirk ji vê derê derkevin. Dema ku sivîl bi awayekî ewle karibin li vê derê bijîn, em ê israr bikin ku divê leşkerên Tirk ji van deran derkevin. Piştre ew ê yekbûna van herêman bidome."

### EM Ê TIRKIYÊ DERXÎNIN!

Nûnerê Meclîsa Daîmî yê Yekîtiya Neteweyî Beşar Caferî jî di civîna Soçiyê de ya ku Tirkiye jî beşdar bûbû, gotinên wekî vî tiştî gotibû. Caferî diyar kiribû ku, bicihbûna Tirkiyê ya li welatê wan 'dagirkerî' ye, hikumeta Sûriyê hewl dide li hemû welat kontrolê bi dest bixe û ew ê çavê xwe ji mayîna leşkerên Tirk a ji bo dema dirêj re negirin. Caferî gotibû ku 'Em ê wan derxînin.'





# Kevana Zêrîn li Ehrezê şahî lidarxist

*Çalakiyên hefteya çandê ya ku ji aliyê Tevgera Kevana Zêrîn a Efrînê ve hatiye organîzekirin berdewam dikin. Tevgera Kevana Zêrîn a Efrînê di çarçoveya çalakiyên hefteya çandê ku li Şehbayê û navçeya Şêrawa ya Efrînê ku dane destpêkirin de şahiyek li navçeya Ehrezê ya Şehbayê li dar xist.*



Çalakiyên hefteya çandê ya ku ji aliyê Tevgera Kevana Zêrîn a Efrînê ve hatiye organîzekirin berdewam dikin. Di vê çaroveyê de şahiyek li navçeya Ehrezê bi amadebûna bi sedan kesî ve hate lidarxistin.
Tevgera Kevana Zêrîn a Efrînê di çarçoveya çalakiyên hefteya çandê ku li Şehbayê û navçeya Şêrawa ya Efrînê dane destpêkirin de şahiyek li navçeya Ehrezê ya Şehbayê li dar xist.
Cihê şahiyê bi wêneyên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, al û sembolên şoreşa Bakurê Sûriyê û alavên kevin hatibûn xemilandin.
Piştî rêzgirtinê, Rêveber Tevgera Kevana Zêrîn Rûmet Beko axivî û anî ziman ku çalakî wekî bersivdayîna binpêkirinên dagirkeran ên li dijî çanda gelê herêmê ye û tekezî li ser girêdana bi çanda gelê Efrînê ve tê organîzekirin.
Piştre jî, Koma Şehîd Silava ya Stranan, li gel dengê def û zirniyê stranên ji kevneşopiya Efrînê û yên şoreşgerî û Koma Viyan Soran dîlan pêşkêş kirin.
Di şahiyê de, şanoya bi navê "Dil û Mejî" û stranên şoreşgerî yên koma "Serdem" a zarokan hate pêşkêşkirin…*ANHA*

## Di nav xwezayê de şevbêrka helbestê



Koma Helbestê ya Amedê ku ji du hefteyan carekê kom dibe û şevbêrkên helbestan li dar dixe vê hefteyê şevbêrka xwe ya helbestê li Gundê Xirbezilê yê Çinarê li dar xist. Mêvanê vê hefteyê yê Koma Helbestê ya Amedê Helbestkar Roza Metîna bû. Roza anî ziman ku ji ber wê li gund di nav xwezayê de û bi germahiya gel re şevek hunerî parve kiriye gelek bextewar e û got: "Xizmeta ji bo zimanê dayikê û hunerê bingeha parastin a nasnameya civakî ava dike. Divê em ji bo nasnameya xwe her di nav têkoşînê de bin."

Koma Helbestê ya Amedê ji du hefteyan carekê bi beşdarbûna helbestkarên cuda û mêvanan şevbihêrkên helbestan li Amedê li dar dixe. Koma Helbestê ya Amedê vê carê li Gundê Xirbizêlê yê Çînara Amedê di nav xwezayê û bi gel re şevbihêrka helbestê li dar xist. Zarok, jin, ciwan ên temenbilind bi dilekî xweş eleqeyek mezin şanî şevbihêrka helbestê dan. Bi xwendina helbestê, nîqaş, sohbetek germ û piştre bi lêdana erbaneyê şevbihêrk bi dawî bû. Herî zêde jinan eleqeyek mezin nîşanî şevbêrka helbestê dan û jinên ku beşdarî şevê bûn anîn ziman ku çand û hunera resen ji gundan tê û ew gelek şanazin ku li gund beşdarî şevbêrka helbestê bûne.

Helbestkar Roza Metîna ya ku mêvana Koma Helbestê ya Amedê ya vê hefteyê bû got: "Bi salane ku zimanê Kurdî bi zext û pêkûtiyen mezin rû bi rû dimîne. Gelek sazî û dezgeyên ku ji çand û zimanê Kurdî xizmet dikirin ji aliyê dewletê ve hatin girtin. Lê ev pêkanîna Şevbihêrka Helbestê ya li gund nîşan dide ku gelê Kurd di nav qalibekî de û tenê di bin siya saziyan de zimanê xwe naparêzin. Gelê Kurd li her derê xwedî li ziman, çand, huner, dîrok û nasnameya xwe derdikevin. Ji ber ku di nav xwezayê de û bi germahiya gel re şevek hunerî me parve kir em gelekî bextewar in. Xizmeta ji bo zimanê dayikê û hunerê bingeha parastin a nasnameya civakî ava dike. Divê em ji bo nasnameya xwe her di nav têkoşînê de bin."

### ME BI HELBESTÊ JINÊN WÊJEVAN NAS KIR

Endama Koma Helbestê ya Amedê Sultan Yaray da zanîn ku wan bi saya Koma Helbestê ya Amedê jinên wêjekar ên nû nas kirine û got: "Ji bo em balê bikişînin ser zimanê dayikê û wêjeya Kurdî em beşdarî Koma Helbestê ya Amedê bûn. Me berê ji berhem û helbestkarên klasîk dest pê kir. Niha em helbestakarên nûjen bi saya Koma Helbestê ya Amedê nas dikin. Gelek helbestkarên jin me bi saya vê komê nas kir. Bi taybet jî jinên ku ked dane wêjeyê em li ser wan disekinin. Ji bo parastina zimanê dayikê divê em li helbest û helbestkarên xwe xwedî derkevin."


### EZ LI ZIMANÊ XWE XWEDÎ DERKETIM

Endama Koma Helbestê ya Amedê Ronahî Çelîk jî anî ziman ku dema ew beşdarî Koma Helbestê ya Amedê bûye ew bêtir li zimanê xwe xwedî derketiye û wiha got: "Dema ku ez beşdarî Koma Helbestê ya Amedê bûm min helbestkar û berhemên nû nas kir û nêrîna min a li dijî jiyanê guhert. Kêfa min bêtir ji zimanê min re hat. Me şevbihêrka xwe ya vê hefteyê li gund li dar xist. Bi xwezayê re em bûn yek. Ev ji bo me bextewariyek mezin e. Li gund çand û ziman bêtir pêş ketiye divê em li vê mîrateyê xwedî derkevin."

### ZEXT LI SER ZIMANÊ KURDÎ HEYE

Endama Koma Helbestê ya Amedê Gulîstan Korban da zanîn ku ji bo wêjeya Kurdî bê dîtin ew di nava hewldanekê de ne û got: "Em niha di nava pêvajoyek dijwar de ne. Gelek zext li ser ziman û wêjeya Kurdî hene. Ji bo wêjeya Kurdî bê dîtin em hewl didin. Dema Koma Helbestê ya Amedê hat avakirin ji 15 kesan dest pê kir. Lê niha ev hejmar gelek zêde bûye. Ev jî nîşan dide ku gel eleqeyê nîşanî ziman û wêjeya xwe dide. Ev koma bû sedem ku nîqaş û fikrên cuda derkevin holê. Ji bo pêşketina zimanê Kurdî ev kom gelek baş e."…*JINNEWS*

## Pirtûkên Ocalan bi eleqe mezin tên xwendin




Li Rojavayê Kurdistanê gel ji pirtûkên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan feyzê digirin û ev yek bandorek mezin li ser jiyana wan dike. Endama Rêveberiya Akademiya Civaka Demokratîk a Kantona Kobanê Cîhan Ebas têkildarî mijarê de got ku divê mirov di jiyana xwe de bi feraseta felsefe û nêrîna kûr a Ocalan tev bigere.

Cîhan Ebas anî ziman ku fikrên Ocalan bandorek erênî li ser jiyana wan dike û got: "Xwendina pirtûkên Rêbertî ji bo me gelek girîng e. Mirov çiqasî bikaribe, bi baldarî pirtûkan bixwîne, wê ewqas bikaribe gavên azadiyê bi fikrên xurt biavêje. Tiştên ku divê bibe parçeyek ji jiyana mirov, pirtûkên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan in. Ji ber ku ji bo gelek kesan dibe naskirina fikrên azad. Li Rojavayê Kurdistanê jî gel bi eleqeyek mezin pirtûkên Serokatî dixwînin."

Cîhan Ebbas diyar kir ku ji ber desthiladariya pergala BAAS'ê zimanê kurdî qedexe kiribû, gelek kesî bi zimanê xwe nizanibû û wiha domand: "Ji ber ku berî Şoreşa Rojava Rejîma BAAS'ê kurdî qedexe dikir û zilm li gel dikir, gelek kesî nikaribû pirtûkên Serokatî bixwenda. Lê niha gelek kes bi xwendina pirtûkên Rêbertî xwe bi pêş dixin. Yên ku pirtûkên wî dixwînin nêrîna wan a li hember cîhanê diguhere."

Ebbas destnîşan kir ku encama ku tê girtin ew e ku fikrên Ocalan roj bi roj tên naskirin û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Piranî di saziyên me de pirtûkên Rêbertî tên xwendin, bi taybetî jî parêznameyên Rêbertî. Her wiha



di perwerdeyan de ev pirtûk tên xwendin. Em jî weke Akademiyê di perwerdeyan de her beşên pirtûkê, ji dayikên xwe re şîrove dikin. Asta xwendina pirtûkên Rêbertî fikir û felsefe da avakirin. Loma xwendina pirtûkên Serokatî parçeyek ji jiyana me ye."…*JINNEWS*

# Çandiniya li ber Dicleyê dewam dike

**Dewleta Tirk ya ku bi êrîşên xwe yên li ser rojava hewl dide ku xebatên çandiniyê jî asteng bike. Li herêma Eyn Dîwerê ku bi çandiniya xwe dewlemend e ji ber êrîşên dewleta Tirk xebatên çandiyê lê kêm bûye. Cotkar jî neçar mane ku çandiniyê li deverên din berdewam bikin.**



Piştî ku dewleta tirk a dagirker nehîşt ku cotkarên gundê Eyn Dîwerê bexçeyên nêzî sînor biçînin, cotkarên Eyn Dîwarê berê xwe dane gundên din û li wir çandinî kirin, da ku beşekî ji xesra xwe vegerînin.
Ev du salin ku artêşa tirk a dagirker nahêle cotkarên gundê Eyn Dîwerê yê girêdayî herêma Dêrikê zeviyên xwe ên li ser sînorê Bakurê Kurdistanê biçînin. Artêşa tirk a dagirker guleyan diavêje her kesê ku diçe nava zeviyên xwe û di encama wê de gelek sivîl birîndar bûn.
Ji ber kiriyarên artêşa tirk a dagirker cotkaran nikarîbûn nêzî 50 hezar donim ku pêdiviyên şêniyên herêma Cizîrê ji zebzeyan bicih dianî, biçînin.
Lê cotkarên Eyn Dîwerê tesllîmî kiryarên dagirkeriya tirkiyê nebûn. Vê carê berê xwe dan gundê Çem Şeref û Şekir Xaçê yên girêdayî herêma Dêrikê yên li ser qiraxa çemê Dicle û li wir dest bi çandiniyê kirine.
Di dawiya demsala zivistanê de cotkarên Eyn Dîwerê amadekariyên çandina havînê dikin. Di hewşên xwe de şitlan diçînin û bi hêvî ne ku di nava zeviyên xwe yên li ser sînor, biçînin.
Ji ber vê yekê Buroya Çandiniyê ya girêdayî Desteya Çandiniyê ya herêma Cizîrê zeviyên li gundê Çem Şeref beramberî pereyên kêm da cotkaran. Ew zevî jî girêdayî buroyên Çandiniyê yên girêdayê Rêvebriya Xweser in.
Cotkarê bi navê Izedîn Abdullah yê ji gundê Eyn Dîwarê ye ku niha li gundê Çem Şeref karê çandiniyê dewam dike diyar kir artêşa tirk guleyan li şênî û cotkarê ku diçin nava zeviyên xwe direşînin û nahêlin şênî nêzî zeviyên xwe bibin û got, “artêşa tirk bi vê yekê dixwaze ku şênin neçar bimînin ji malên xwe derkevin.”
Abdullah destnîşan kir ku zeviyên Eyn Dîwarê pêdiviyên herêma Cizîrê ji zebzeyan bi cih di anîn û damara sereke ya aboriya şêniyên herêmê bû û wiha dewam kir, “ji ber ku li herêmê çandinî zêde ye û şêniyên herêmê çandinyê esas digrin. Lê di vê demê de ji ber kiryarên artêşa tirk a dagirker berhemên wan pir kêm bûn.
Li gorî cotkar Izedîn Abdullah ne tenê kiryarên artêşa tirk a dagirker xema cotkaran e, di vê salê de gelek nexweşî û kêzik derketin her wiha germahiya meha Tîrmehê û buhabûna semadê û dermanên mêşûmoran jî bandoreke neyînî li berheman kir.
Li gorî Endezyar û yek ji rêvberên komîteya Parastina Berheman Fehed Elawî tekez kir ku derketina kêzika zerar li zeviyan kir û destnîşan kir ku ji bo reşandina derman komîteyên fenî rê û rêbaz ji cotkaran re gotin.
Elawî destnîşan kir ku ew weke komîteya Parastina Berheman wê pêwîstî û alavên ji bo reşandina dermanan bidin cotkaran…*ANHA*

## Apê Ednan dar û kulîlkan diçîne



Apê Ednan ji Kobanê ye, ev 15 sale di baxçeyên dar û kulîlkan kar dike. Di çandina dar û kulîlkan li kolan û gulistanan ji bo hawirdorek pak bi şaredariyê re dibe alîkar.
Kobanê piştî wêrankirina DAIŞ’ê niha bi dar û ber û kulîlkan şîn bûye. Apê Ednan Hemê yê 45 salî jinûve dest bi çandina dar û kulîlkan kir.
Beriya niha bi 15 salan Apê Ednan di gulistanên dar û kulîlkan li Helebê kar dikir.
Apê Ednan ji biçûkahiya xwe ve koçberî Helebê bû. Bi destpêkirina şoreşa Rojava re çû Tirkiyê û piştre vegeriya Kobanê.
Apê Ednan ev bû saleke ku vegeriya Kobanê.
Apê Ednan hema dest bi karê xwe kir û baxê yekemîne li ser asta bajêr bi navê Baxê Kobanê vekir.
Baxçê apê Ednan li aliyê başûrê rojavayê Kobanê ye. Apê Ednan tê de gelek şitlên kulîlk û darên berhemdar ji 37 cureyan difiroşe.
Apê Ednan dibêje ku armanca wî ji vekirina bexçe tevî bicihanîna debara xwe ya rojane, her wiha ji ber ku ew ji sirûştê hez dike.
Apê Ednan tekez kir ku ew bi Rêveberiya Xweseriya Demokratîk û bi Şaredariya Gel re ji bo çandina dar û kulîlikan li kolan û gulistanên giştî yên bajêr hevkariyê dike.
Apê Ednan diyar kir ku ew şitlan ji Helebê û Minbicê tîne.
Apê Ednan got : “Dar û kulîlik mîna xwedîkirina zarokan baldariyê dixwazin. Dema ez di bexçe de dixebitim derûniya min baş dibe.″
Her wiha Apê Ednan spasiya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk û Şaredariya Gel a Kobanê ji bo çandina dar û kulîlikan bi armanca şînkirina bajêr û parastina hawirdorê li bajêr, kir…*ANHA*

## Rêyên Reqayê tên sererastkirin



Şaredariya Gel a Reqayê xebatên sererastkirina rêyên sereke û qîrkirina wan di hundirê bajarê Reqayê de, berdewam dike. Piştî kolana El-Saciyê û embarên genim hatin sererastkirin, şaredarî niha kolana Til Ebyed ku kolana herî qerebalix li navenda bajarê Reqayê ye, sererast dike.
Ji bo astengiyên di çûyîn û hatinê de ku xwediyên erebeyan dikşînin çareser bibe, Şaredariya Gel a Reqayê xebatên xwe yên sererastkirina kolan û rêyan dewam dike. Di vê çaroveyê de, şaredarî piştî ku kolanên El-Saciyê û embarên genim sererastkirin kir, niha dest bi çêkirina kolana Til Ebyed ku dirêjiya xwe 3 km kir.
Hevserokê Şaredariya Gel a Reqayê Ehmed Ibrahîm got: ″Em ê destpêkê de kolanên sereke û yên ku di encama şer de xerab bûbûn, sererast bikin. Xebatên me yên sererastkirina kolan heta ku hemû kolan werin çêkirin û qîrkirin dewam wê dewam bike.″
Piştî ku şervanên QSD`ê bajarê Reqayê di 20`ê cotmeha 2017`an de ji çeteyên DAIŞ`ê rizgar kirin, Meclisa Sivîl a Reqayê karê xwe ji bo avakirina bajêr berdewam dike…*ANHA*

## Rêxistina Sara dewreyek ji bo zarokan vekir



Li bajarê Kobanê Rêxistina Sara ya Têkoşîna li dijî şideta li ser Jinê bi armanca bilindkirina asta zarokan û pêşxistina wan di aliyê ziman de dewreyeke perwerdeyê vekir.
Rêxistina Sara ya bajarê Kobanê dewreyeke perwerdeyê ji bo bilindkirina asta zarokên Kobanê vekir. Perwerdeyê di 7’ê Tîrmeha 2018’an de dest pê kir.
Di perwerdeyê de 220 zarok cihê xwe digirin, di dewreyê de waneyên zimanê Kurdî, Erebî, Îngilîzî û waneyên hunerî tên dayîn.
Zarokên ku cihê xwe di dewreyê de digirin ji temenê 7 salî heta 14 saliyê ne. Perwerde heta dibistan vebin wê dewam bike. Perwerde rojane tê dayîn û seat di 09.00’an de dest pê dike heta seat 13.00’an dewam dike.
Ji rêveberiya Rêxistina Sara Şêrîn Mislim derbarê vekirina dewreya perwerdeyê de axivî û wiha got: “Armanca me ji vekirina perwerdeyê ew e ku em asta zarokan bilind bikin û zarok dûrî xwendinê nekevin. Her wiha ji ber ku festîvala zarokan nêzîk ma ye, me xwest em beşeke hunerî ji zarokan derxin.”…*ANHA*

### EW ROJ
## Komkujiya Şengal



Farûk SAKIK

Li dijî Kurdan û destketinên Kurdan hin hêzên çete hatin organîze kirin. Bi navê El-Nusra û DAÎŞ êrîşî Kurdistanê kirin. Berxwedana Kurdan ev êrîşên wan vala derxist.
Û di 10ê Hezîrana 2014an de ev çeteyên DAÎŞ ketin Mûsilê. Û ji bo Kurdistana Başûr tehdîtek nû destpêkiribû. Ev talûke gav bi gav nêzî herêmên Êzidiyan dibûn.
EWROJ....
Û ew roj hat di 2ê Tebaxa 2014an Çeteyên DAÎŞ Şengal dagirkirin.
Komkujiyê destpêkir. Gel ji ber êrîşan xwe spartin çiyayê Şengalê. Gelek kesên, bi giranî zarok û yên temen mezin ku vê ji komkujiyê xilasbûn jî li çiya ji tîna û birçîbûna jiyana xwe ji dest dan. Herêma Şengal herçiqas bi statu bi Baxdatê ve girêdayî be jî di ware leşkerî ve bi Pêşmergeyan ve dihat parastin. Lê ev hêz jî dema talukeya DAÎŞ nêz bû vekişiyan û gelên herêmê bi sere xwe man. Şengal hatibû dagirkirin komkujiyê despêkiribû. Yên ji komkujiyê xelasbibûn li çiyayan li benda ewlekariyê bûn. Ji van deveran qêrîn û hawar bilind di bû.
Bersiva yekemîn ji vê hewarê re ji Qendîl hat. Ji aliyê Fermandariya HPGê hat. Murat Karayilan ewroj daxwijyaniyek da. “Gelê me ku bi komkujiyê re rûbirû mane derketine çiyayê Şengalê. Dive ev li wê derê werin parastin û di demek kurt de jî werin rizgarkrin. Gelê meyê derve mereq dikin; lê emê îşev midaxle bikin”
Û Gerîlayên HPG’ê berbi şengalê birêketin. Hatin û li herêmê bicihbûn. Pêşî li êrîşa girtin. Ewlekariya gel mîsogerkirin.
Beriya ku ev gerîlla werin komek gerîlla ku ji 12 kesan pêk dijhat li heremê bû. 5 kes ji aliyên PDKê ve hatibûn girtin, lê 7 kes bi qehremaniyek, gel ji felaketên mezin parast.
Ji wan heft kesan Ronî Dirbêsa jî wiha behsa wan kêliyên berxwedanê dikir: “..Dema DAÎŞ êrîşî vê girî kir, me lêda û ji neçarî paşve kişiyan. Mirov pêrîşan bibûn. Zarok û pîr mirîbûn. Hin kes ji aliyê DAÎŞê ve dîl hatibûn girtin û aqûbeta wan nedihat zanîn. Bi alên PKKê û bi posterên Serok di nav gelde em digeriyan û me moral dida wan. Me bawerî da wan ku emê wan rizgar bikin. Di nava 2 rojan de hejmara me derket 1.500 kesî. Di roja sisiyan de dema ku hevalên me hatin, me hinek dina rehet kir. Korîdora ku ji aliyê YPGê ve hat avakirin, pêşî li trajediyek mezin girt”
ÎROJ.......
Di komkujiyê de gelek jin û zarok hatin revandin li bajarên Sûryê û Iraqê wek kole hatin firotin. Tecawizî gelek jinan hat kirin. Gelek kes neçarî qebûl krina dînê Îslamiyetê kirin. Gelek avahiyên pîroz hatin talan kirin. Dest dane ser mal û milkên ezidiyan.
Piştî gerîla li hewara wan hat korîdorek ji çiyayê Şengal hetanî Rojava hat rizgarkirin û gelê li çiya mexdûr mabûn neqlî van devêran kirin. Li kampê rojava û Bakûrê Kurdistan hatin bicih kirin.
Di dîrokê de 72 komkujî biçûk mezin li dijî êzidiyan pêkhatibû. Di sala 2014an de ceribandinê komkujiya 73an destpêkiribû, lê ev ewê wisa hêsan nebûya. Êdî hêzên Kurdan yê ku wan biparêzên yên ewlekariya wan mîsogerbikin hebû. Di destpêka komkujiya Şengalê de ev hêz li kêleka wan bûn. Li hember vê komkujiyê dinya kerr û bêdeng bû. Hemû peymanên di şerde parastina sivîlen ew roj hatin ji bîrkirin. Wek hemû komkujiyan di vê komkujiyê de jî Kurdan bi xwe dikaribûn birînên xwe derman bikin û wan jî wisa kir. Di nav Kurdan de rihek neteweyî hat afirandin û hemû Kurdan berê xwe dane Şengal.



# Konferansa Kongreya Star de biryarên girîng

***1.Konferansa Rêxistina Kongreya Star a Qamişlo ku bi duruşmeya “Bi rihê Berxwedana Serdemê em şoreşa jin veguherînin şoreşa civakî” di 31’ê Tîrmehê de li bajarê Qamişlo hat lidarxistin bi biryarên girîng bi dawî bû. Di konferansê de plansaziya du salên pêş hat derxistin û koordînasyoneke nû hat hilbijartin.***

1.Konferansa Rêxistina Kongreya Star a Qamişlo bi biryaran û hilbijartina koordînasyona nû ya kongreyê bi dawî bû.
Xebatên 1.Konferansa Kongreya Star a Qamişlo ku li navenda Çand û Hunerê ya Mihemed Şêxo bi dirûşemeya “Bi rihê Berxwedana Serdemê em şoreşa jin veguherînin şoreşa civakî” dest pê kiribû bi biryaran bi dawî bû.
Di konferansê de, pilansazî û biryarên 2 salên pêş hatin pêşkêşkirin. Ji wan; Piştgiriya berxwedana Efrînê, berdewamkirin û bilindkirina têkoşînê ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah, xurtkirina têkiliyên bi hemû beş û pêkhateyên Bakurê Sûriyê û pêşxistina qada doplomasî.
Di dawiyê de, ji bo hilbijartinên rêveber û komîteyên koordînasyona kongrê ya Qamişlo dengdan dest pê kir. Li gorî piraniya dengan Ranya Remo, Zubeyda Elî, Rîhan Temo, Welîda Îbrahîm, Sena Xelîl, Şirîn Xelîl wekî rêveberên komîteyên koordînasyonê û Eyhan Murad, Medya Mihmûd, Necah El-Qeso, Şaha Xelo û Munewer Xalid wekî rêveberên koordînasyona Kongreya Star a Kantona Qamişlo hatin hilbijartin.
Koordînasyona nû sond xwarin ku ew ê riya şehîdan û xeta Netewa Demokratîk bişopînin.
Axaftina dawî ya konferansê ji aliyê Rêvebera Kongreya Star Henîfa Mihemed ve hate kirin. Henîfa spasiya beşdarên konferansê kir û konferans wekî gaveke mezin ber bi rêxistinkirina jin di her qadan de destnîşan kir.
Konferans bi qîrkirina dirûşmeyên “Jin, Jiyan û Azadî” bi dawî bû.



## Jina ku hatibû renvandin kiryarên çeteyan vegot



Jina bi navê H.S 8 caran ji aliyê çeteyên girêdayî artêşa tirk a dagirker ve hate revandin. Beramberî serbestberdanê mîqdareke mezin ji pereyan da çeteyan da ku karibe ji gundê xwe derkeve.
Jina bi navê H.S. yek ji şahidên kiryar]n artêşa tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê li Efrînê ye. Artêşa tirk a dagirker û komên çete yên girêdayî wê hovîtî û wehşehta xwe li dijî welatiyên Efrînê didomînin.
Welatiya bi navê H.S. ku berê endama Hêzên Parastina Civakî bû, serpêhatiya xwe vegot.
Welatiya bi navê H.S. ji şêniyên gundê Gewrika yê girêdayî Cindirêsê ye. H.S. serpêhatiya xwe wiha vegot: “Piştî ku artêşa tirk û komên çete herêma Efrînê dagir kir, ez ji ber nexweşiya dayika xwe neçar mam di gund de bimînim. Di wê demê de hevserê min jî li eniyên şer di nava xebatên berxwedanê de bû.”
H.S. got: “Piştî ku çeteyan agahî li ser endamiya min a di nava Hêzên Parastina Civakî (HPC) de girt, nîvê şevê bi ser mala min de girtin û ez revandim, birim baregeha xwe ya li gund. Bi min re li ser erkên ku ez pê rabûme lêpirsîn kirin û ji min agahî li ser cihê şervanan xwestin.”
H.S. diyar kir ku kiryarên çeteyan li herêma Efrînê derexlaqî ne û got ku ew 8 caran hatiye revandin û wiha dewam kir: “Çeteyan di lêpirsînê de gefa kuştin û destdirêjî û îşkenceyê li min dixwarin.”
H.S. da zanîn ku çeteyan bi awayekî derexlaqî îşkence li jinan dikirin û got: “Di destpêkê de ji bo ku çete agahiyan wergirin tenê gefa revandinê li welatiyan dixwarin. Piştî ku hin agahî derbarê hin welatiyan de werdigirtin gelek welatî revandin û bi şêwazên derexlaqî îşkence li wan dikirin.”
H.S. da zanîn ku çeteyan kirrîna xetên telefonê yên tirkî li ser welatiyan ferz dikir da ku karibin guhdariya welatiyan bikin û agahiyan bêtir wergirin.
H.S. ev tişt got: “Ji bo derketina ji gund me 150 hezar lîreyên Sûriyê dane çeteyekî da ku ez karibim derbasî navçeya Şêrewa bibim. Me gelek zordarî kişand û em di gelek metirsiyan re derbas bûn.”
H.S. wiha dawî li axaftina xwe anî: “Piştî ku em gihîştin Şêrawa, di rojên destpêkê de ji ber zexta derûnî gelek xewnên nexweş min didîtin. Lê di van demên dawîn de ez dilaram im.”…*ANHA*

## Em ê li ber fermanan serî netewînin



Hevseroka Yekîtiya Êzidiyên Herêma Efrînê Suad Hiso salvegera 4’emîn a Komkujiya Şengalê bi bîr anî û diyar kir ku fermana 74’an a ku li ser serê Êzidiyan pêk hat ji êrîşên li ser Êzidiyên li Efrînê ne cuda ye û diyar kir ku ew ê li dijî fermanan tu carî serî netewînin û li berxwe bidin.
Di 3’ê Tebaxa 2018’an de Çeteyên DAÎŞ’ê bi awayekî hovane êrîşî Şengalê kirin û komkujî pêk anîn. Bi hezaran kes qetil kirin û bi taybet jî jin hedef girtin. Bi hezaran jin revandin û ew li bazaran wekî koleyan firotin. Hevseroka Yekîtiya Êzidiyên Herêma Efrînê Suad Hiso têkildarî mijarê diyar kir ku wan hêza xwe winda nekirine ew li ser piyan e û got: “Ji dîrokê heta niha her dem Êzidî bi fermanan rû bi rû mane. Êzidî bi saya fikrên Rêber Apo bi hêztir bûne û berxwedana xwe domandine.”
Suad Hiso diyar kir ku ew bûne şahidên êşa fermana 74’an û got: “Dema ku çeteyen DAÎŞ’ê êrîşî Şengalê kirin di destpêkê de jin hedef girtin. Niha 3 hezar jin hîn destên çeteyan de ne. Divê hemû cîhan bibe yek û li dijî zilma ku li jinên Êzidî hatin kirin bisekinin. YPG/YPJ gihiştin hewara Êzidiyan û bi hezaran Êzidî ji komkujiyê rizgar kirin. Çeteyên DAÎŞ’ê dema ku êrîşî Şengalê kirin xwestin Êzidiyan tune bikin. Lê Êzidî tu car nayên tunekirin. Lê tevî hemû zordestiyan Êzidî li dijî zilmê sekiniye. Em ê têkoşîna xwe ya li dijî dagirkeriyê bidomînin.”…*Lîlav Elî /Şehba*

## Rojek bi êşa sedê salan bû

**Melek DEMÎRTAŞ**

Di roja êrîşa bê bext û xayîn 3’Tebaxê ku çetyên DAIŞ’ê mîna maşîneya mirinê êrîşî Şingalê kirin, ji bo ku gel ji komkujî û qirkiirnê xilasbin, reviyan û bi nav çol û çiyan ketin. Di riya korîdora ku YPG û YPJ’ê vekirin gelek êzdiyan gihandin cihê bi ewle ew jî kampa Newroz eku di heman demê hate ji bo şingaliyan hate avakirin. Di vê kamopê de gelek çîrok hene lê ew çîrokana bi pênûs anjî kamêrayê nayê vegotin, tenê dîdarê wê facîya ya ku çetên DAIŞ’ê bi serê Êzdiyan anîn dikarin ku tî, birçî û meşa rojan da ku ji maşîneya mirinê DAIŞ’ê xilasbibin dikarin vebêjin. JI bo wê jî Rojnameya Ronahî berê xwe da kampa Newroz ku hind ew çîrokên êşa roja reş ji xwendevanên xwre vebêjin.

### ME XWE SİPARST ÇİYA

Dayika bi navê Besê Qasim bi temenê xwe 75 salî ye destpêka vegotina çîroka roja reş û êş bi çavên tijî rondik, ku ev 4 salin hîn li benda agahiyek ji herdu law û hevjîne xwe ye. Ydaê Besê bi keserk êş kişan û çîroka xwe destpêkir: “Di wê roja tarî de agahî hate ji mer ku DAIŞ’ê êrîşî Şingal û gundewarên wê dike, em ji Şingalê reviyan û me berê xwe da çiya. Piştî em sê rojan me li nav çiya û newlan qedand yek ji mirovên me telefon kir û got; “Vegerin herêm bi ewle bûye”, li ser vê agahiyê em vegriyan Sinunê lê, me dît ku DAIŞ’ê her der dagir kiriye, lawikê min Xalid got emê vegrin, di wê demê me nezanîbû ku em çibikin û biçin kûderê. Me berê xwe da rojhilatê Sinûnê, maşîneyek li pêşiya me rast het, me got qey maşîna sivîlan da ku me xilasbikin hatine ji bo wê jî em rawestiyan lê, maşîneya çeteyan bû, herdû lawik û hevjîn û min jî bi gelek pîre jinên dinre me dîlgirtin û berê me dane (Xane Sorê).”



### TENÊ SÛÇÊ WÊ KU XWEST AZAD BE

Dayika Besê anî ziman ku tenê sûçê wê xwest xilasbibe û wiha dom kir: “Jinek hewl da ku ji destê çetan bireve lê, çeteyan ew girtin û li ber çavên me cercurek(Mexzenek) tam li wê jina êzdî valakir, bi vê hovîtiyê wek ku bêjin me (ku hinjî bazdin wê rewşa we jî wiha be) ew bûyer ji ber çavê min naçe. Em demekê li Xane Sorê dîl man, piştre me hemûyan ji hev cûda kirin jinên êzdî birin Sûriyê li bazarên Reqayê hatin sebîrkiirn, frotin tecawizkirin û şewtandin tenê sûçê wan çima ku êzdî bûn, her wiha zilam, herdu lawik û hevjhînê min jî da nav wande birin cihekîdin, ku ew cara dawî bû min ew dîtin û heya roja îro tu agahî ser wan tuney.”

### 4 SALİN HÎN ÇAVÊ MİN Lİ Kİ RİYA WANE

Dayika Besê ji êşa canê xwe di xwest ku herdu lawik û hevjînê wê mirinbana wê ji vê êşê baştirbe û wiha got: “Ev 4 salin ez nizanim saxin anjî li ser kîşan axê veşartîne, car caran di hundirê xwede dibêjin “Ku wan kuştiban ji vê êşê çêtire bû, ku ez bi hesrta wan rojana dimirim”. Piştî bi mehekî ez û jinên bi bi temen mezin berdan, ez li başûrê kurdistanê mam, beriya du mehan nû hatim Rojava û li kampa Newroz bi cih bûm. Rstî alîkarî kême, lê tenê di jiyanê de yek derdrê min heye ew jî agahiyê ji zarok û hevjînê xwe bigrin ku saxin an mirîne.”

# Artêşa Tirk li hember gerîla têk çûye

***Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Mûrad Karayilan ji yekîneyên gerîla re axivî û diyar kir ku artêşa Tirk li hember şerê gêrîla têk çuye lewma êdî tenê teknîka hewayî bikartîne. Karayilan wiha got, "Dewleta Tirk piştî ku dît di şer de têk çûye, ji Îlona 2016'an û pê ve biryar da ku şer êdî bi amûrên hewayî bidomîne."***



Karayilan got, "Ya ku niha di rojevê de ye, tasfiyeya me, tasfiyeya PKK'ê nîne. Ji ber ku ew ji tasfiyebûna xwe ditirsin, bi her awayî êrîş dikin."
Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Mûrad Karayilan roja 27'ê Tîrmehê bi rêya cîhazê ji yekîneyên gerîla re axivî û rojeva Kurdistan û Rojhilata Navîn nirxand. Karayilan got, "sîstema yek zilamiyê ya xwe dispêre şer wê têk biçe."
Karayilan diyar kir ku berhemên şoreşgerî yên di nava têkoşîna wan a 45 salan de hatin afirandin, ne tenê şoreşa Kurdistanê her wiha şoreşa Rojhilata Navîn xistiye rojevê û got, "Şerê bê eman ê ku rejîma faşîst a Tirk li dijî geşbûna şoreşgerî ya Kurdistanê da destpêkirin, 3 salan li pey xwe dihêle. Di nava van 3 salan de, desthilatdariya AKP-MHP'ê li ser bingeha 'Plana Têkbirinê' ji bo karibe encamê bi dest bixe, hemû rê û rêbazên hilweşîner û faşîst bi kar anî. Li dijî Rêber Apo dest bi şerekî giran kir."

### ARTÊŞA TIRK TÊK ÇÛYE

Karayilan da xuyakirin ku artêşa Tirk li hemberî gerîla şerê bejahî winda kiriye û ji bo vê têkçûna xwe binixumîne, serî li teknolojiya serdemê daye. Karayilan ev tespît kir: "Artêşa Tirk ku di şerê dijî gerîla de têk çû, şerê li Kurdistanê bi berdêla bi milyaran dolarî veguherand şerekî teknolojîk. Ji bo vê jî bi her awayî mesref kir. Dewleta Tirk piştî ku dît di şer de têk çûye, ji Îlona 2016'an û pê ve biryar da ku şer êdî bi amûrên hewayî bidomîne."

### PKK JI NAVA GEL AFIRIYE

Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Karayilan destnîşan kir ku Tevgera PKK'ê beriya her tiştî xwe dispêre rastiya gelekî ku reh berdaye nava dîrokê û got, "Heta ku koka civaka Kurdistanê li ser vê axê hebe, bîrdozî û felsefeya Rêber Apo jî wê hebe. Ya ku ev civak ji xweliyên xwe afirand û gihand vê astê, ev bîrdozî ye."
Karayilan got, "Ya ku niha di rojevê de ye, tasfiyeya me, tasfiyeya PKK'ê nîne. Ji ber ku ew ji tasfiyebûna xwe ditirsin, bi her awayî polîtîkayeke êrîşkariyê dimeşînin."
Karayilan işaret bi tifaqa AKP-MHP û Ergenekonê kir û got, "Ev hêzên ku berê dijberê hev bûn, meşandina şerekî bê eman ê li dijî gelê Kurdistanê weke berjewendiyên xwe yên hevpar dîtin. Gotin ku eger vê nekin wê tasfiye bibin. Bi vî rengî ne tenê li nava sînorên Tirkiyê, biryar dan ku li Rojava, Başûrê Kurdistanê û hev deverê li dijî PKK'ê û destketiyên gelê Kurd têbikoşin."

### LI EFRÎNÊ MÊTINGERÎ TÊK ÇÛ

Mûrad Karayilan bi bîr xist ku rejîma AKP-MHP'ê navê 'Şerê Nû yê Serxwebûna Tirkiyê' li vî şerê xwe kir û wiha dewam kir: "Jê re gotin 'şerê man û nemanê' ye. Bi xwe mikur hatin ku ya tasfiye dibe PKK nîne. Ya tasfiye dibe planên dîktatoriya Erdogan û sîstema netewe-dewletê ya Tirk e."
Karayilan da xuyakirin ku dewleta Tirk ji ber ku li pêşberî gerîla nekarî bi ser bikeve, êrîşa li dijî Efrînê xiste rojevê û bi vî awayî xwest rewşa xwe ya têkçûyî binixumîne. Karayilan got, "Ji wan hebû ku bi êrîşên giran ên bi balafirên şer wê karibin di nava sê rojan de bikevin nava Efrînê, wê şovê bikin, moralê bigirin û bi vî rengî derbê li Tevgera Azadiyê ya Kurdistanê bixin. Lê belê li Efrînê li bin guhê Berxwedana Serdemê ketin. Nêzî 3000 hezar leşker û çeteyên wan mirin. Li Efrînê berxwedaneke gelekî mezin hate nîşandan. Ne dopînga moralê, ne jî ranta siyasî nekarîbûn li Efrînê bi dest bixin. Bi vî rengî aboriya wan serberjêr bû."
Karayilan diyar kir ku niha ketibin nava Efrînê jî têkoşîna gel û şervanên Efrînê dewam dike û bi têkoşîna azadiyê ya li her devera Kurdistanê re mêtingeriya netewe-dewleta Tirk a faşîst hîn bi lez têk diçe."

### EM Ê ŞER DE BI SER BIKEVIN

Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Karayilan destnîşan kir ku bi bi şerekî serketî yê gel ê şoreşger ew dikarin têkoşîna xwe bi ser bixînin û got, "Lê belê şertê destpêkê yê vê yekê ew e ku pêvajo rast were xwendin, xeta leşkerî ya pêvajoyê baş bê fêhmkirin û bi cih were anîn."
Karayilan diyar kir ku di vê serdema herî girîng a dîroka wan a têkoşînê de, bi geşkirina şerê gerîla û bi xwegihandina li perspektîfa Şerê Gel ê Şoreşgerî wê bi ser bikevin. Karayilan got, "Pratîka Şerê Gel ê Şoreşgerî eger li Kurdistanê bi cih were anîn, wê pêla faşîst qirker a AKP-MHP û Ergenekonê bişikê."Di dawiya axaftina xwe de Karayilan destnîşan kir ku bandora şerê li Kurdistanê êdî tenê li Kurdistanê namîne û got, "Ji bûyerên ku niha diqewimin jî tê dîtin ku ev yek wê li Tirkiyê rê li ber veguherîneke demokratîk veke û li Rojhilata Navîn jî pêşî li pêvajoyeke nû ya şoreşgerî veke."



## Hevdîtinên MSD û Sûriyê

Tayip TEMEL

MSD û hikûmeta Esad ji bo çareserkirina pirsgirêkên Sûriyeyê di 26'ê tîrmehê de dest bi hevdîtinên çareseriyê kirin. Hevdîtin li ser navê MSD û hikûmeta Sûriyeyê tên kirin lê di esasê xwe de kurd û desthilatdariya BAAS'ê muzakereyan dikin. Ev hevdîtin bi çi awayî tên kirin, ji ber kîjan sedeman û bi kîjan armancên stratejîk pêk tên, divê bên zelalkirin. Her hiwa di hevdîtinan de ji bo hêzên kurd feraseteke çawa pêwist e, divê bê diyarkirin.Di pêvajoyeke wisa aloz de, destpêkirina hevdîtinên çareseriyê girîng e. Hevdîtin ji geşedanên Rojhilata Navîn, ji konjuktura nû û ji pêngavên hêzên kurewî ne cuda ye. Nemaze jî dagirkeriya Rojhilata Navîn, di nav helwesteke hevkar, hevdeng û hevpar de tevdigere. Dagirkeriya Tirkiye, Îran, Iraq û Sûriyeyê her çiqasî 'yek bi yek' ji dewletên cuda pêk tên jî, di navbera wan de hevgirtineke nixumî, domdar û stratejîk heye. Tevgera erênî ya hikûmeta Sûriyeyê ya di mijara hevdîtinan de jî, işaretê bi ev şêwra dagirkeriya herêmê dike.Dagirker li dijî berxwedana gelê kurd tengijîn, ditengijin û li rêyeke pêşîgirtina li berxwedana gelê kurd digerin. Li rêyeke domandina statukoyê digerin. Hewl didin ku rêya azadî û demokrasiya Kurdistanê bixetimînin. Ji bo ku destkeftinên kurdan pûç û bêwate bikin, bi şêwr û tifaqeke nixumî Tirkiye ji aliyekî de, Îran ji aliyekî de, Iraq û Sûriye jî ji aliyekî de; li qada neteweyî û navneteweyî taktîkên siyasî û dîplomatîk disepînin. Bextreşiya kurdan a dîrokî ew e ku vê karesatê nabînin.Niha BAAS'a faşişt çi dibêje: "Werin em pirsgirêkên xwe bi hevdîtinan çareser bikin. Lê beriya her tiştî hûn Reqqa û Hasekê biterikînin. Li her warên ku hûn lê ne, serdestiya hikûmeta Sûriyeyê bipejirînin. Li Kurdistanê alên xwe deynin û tenê alên hikûmeta Sûriyeyê hildin. Têkiliyên xwe yên bi dewlet û hikûmetên derve re betal bikin, ji derveyî venêrîn û rêvebirina hikûmeta BAAS'ê bi tu awayî têkilî û hevkariyên neteweyî û navneteweyî pêk neynin…
Êêê piştî ku we ev xal bi cih anîn, em ê jî der barê hinek mafên we de, ligel nirxên 'xwerêxistinkirin û xwerêvebirinê' hestyar tevbigerin…" Dahûrandina vê nêzîkatiyê, gelekî aloz e.Pêwist e ku em bi tîpên gir binivîsin; Divê kurd kompleksa binikiyê ji ser xwe bavêjin; divê bi hêzên kurewî û navneteweyî re bêtirs û bêkomplesk têkiliyên siyasî û dîplomatîk pêk bînin. Divê yekparî û yekpergaliya dagirkeriya Rojhilata Navîn, hew rojekê jî ji bîr nekin; divê kurd zanibin ku jiyana kevn derbas dikin û cîhaneke nû ava dikin; divê kurd li dîroka xwe lêkin ku ji bo wan dijberiya sereke dagirkeriya herêmê ye; divê kurd li dijî pergala dagirkeriyê hem di navbera xwe de û hem jî bi hêzên kurewî re tifaqên stratejîk girêdin; divê kurd hevdîtin û muzakereyan jî, ligel mutefîk, çavdêr û garantorên navneteweyî û bi awayekî nivîskî pêk bînin û encamên van hevdîtinan wekî destkeftinên neteweyî li dîrokê binivîsin.Lazim e MSD nehêlê ku dagirkeriya herêmê muktesebata gele kurd ji dest derxe. Divê kurd her mafên xwe yên bingehîn bi hikûmetê bidin erêkirin û mohrkirin. Her wiha divê hikûmeta Sûriyeyê ji niha de qebûl bike ku wê bakurê Helebê, Çiyayê Kurmênc û Îdlibê bê şerd û şirûd dewrî MSD'ê bike; divê kurdî bi zimanê fermî be; divê ala xwe jî ligel ala hikûmetê li ba bibe; divê hikûmet îlan bike û bi Makeqanûnê teqez bike ku îradeya gelên Bakurê Sûriyeyê nas dike; divê hikûmet tevgera xwe ya kontra û navendên xwe yên taybet ku ji bo destkeftiyên gelê kurd têk bibe bi hevkariya Tirkiye û Îranê ava kirine, betal bike; divê hikûmet pergala federaliyê ya bakurê Sûriyeyê bi awayekî bêveger qebûl bike.

## Azadiya Ocalan azadiya gelan e



Endamê Desteya Rêveber a Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD'ê Esed Menan tecrîda girankirî ya li ser Rêberê gelê Kurd Abdulah Ocalan weke tecrîda li ser tevahî gelê Kurd pênase kir û got: "Desthilatdaran dixwestin navebera galan, bi taybet gelên Kurd û Tirk de şerekî demdirêj derxînin. Lê Ocalan bi berxwedaniya xwe hemû planên wan vala derxist."

### RIYA XWÎNÊ GIRT

Endamê Desteya Rêveber a PYD'ê Esed Menagot; "hêzên destê wan di dîlgirtina Rêberê gelê Kurd Abdulah Ocalan de hene, dixwestin şerekî qirêj ku bi dehan salan dirêj bike, navbera herdu gelên Kurd û Tirk de çêbiba. Berevajî wê, Rêberê gelê Kurd birêz Abdulah Ocalan bi stratejiya xwe ya aşîtiyê rê li ber wê kompoyê girt. Ji bona ku gelên li herêmê bi hev re bijîn jî hişmendî û felsefeya Netewa Demokratîk afirand. Bi vê yekê Rêber Ocalan rê li ber rijandina xwînê li herêmê girt."

### ÇARESERÎ RAMANÊN RÊBER APO YE

Menan di dewama nirxandina xwe de, diyar kir li hember krîza li herêmê netewa demokgraîk alternatîfeke çareseriyê ye û wiha dewam kir, "Niha li Rojhilata Navîn hêzên serdest dixwazin sîstema netew dewlet mayînde bikin. Êdî xetiminî ne û ji pirsgirêkên heyî re nabin çareserî. Berevajî, bûne sedema kirîz û kaosan. Lê paradîgmaya Rêber APO xweseriya gelan a ziman, çand û neteweyî esas digire. Hemû gelên li herêmê dikarin li gorî xweseriya xwe bi awayekî azad û wekhev bijîn. Menan di dewama nirxandina xwe de qala rewşa li Sûriyê jî kir û got: Ji ber vê hişmendiya serdest, li Sûriyê ti hêzeke ku bikaribe nûnertiya azaweriyên gel bike derneket. Her gel derbasî nava komkujî û qirkirinan kirin. Lê li herêmên Kurdan ku pala xwe didin felsefeya Rêber APO a Netewa Demokratîk, biratiya gelan, jiyana hevbeş û azadiya fikir û ramanê bi pêş ket."

### TÊKOŞÎNA OCALAN A GELAN E

Menan got: "hemû hêzên desthilatdar, di serî de Tirkiyê, ji fikir û ramana Rêber APO ditirsin. Ji ber vê jî dewleta dagirker a Tirk tecrîd li ser Rêberê gelê Kurd Abdulah Ocalan giran kiriye. Nahêle malbat, parêzer û ne jî şande serdana wî bikin. Dizanin ku Rêbar APO hêza wî heye hemû pirsgirêkan bi yek hevokê çareser bike."
Endamê Desteya Rêveber a PYD'ê Esed Menan dawiyê de wiha got: "Rojhilata Navîn ji her demê bêtir hewceyî pratîzekirina fikrên Ocalan e. Pêwîste saziyên navneteweyî û bi taybet ên mîna CPT`yê xwedî li erkên xwe derkevin û bi awayekî exlaqî nêzî doza Rêberê gelê Kurd Ocalan bibin. Rêber APO li hemberî hişmendiya desthilatdaran têkoşîneke zihnî ya bê hempa dide meşandin. Ji ber vê jî em dibêjin; azadiya Rêber APO azadiya hemû gelên bindest misoger dike."… ***Ronahî***




# Cîhanê li hember Efrînê rola sê meymûnan lîst

***Dewleta Tirk piştî ku Efrîn dagirkir û şûnde dest bi talankirin, êşkence, kuştin û revandina welatiyên sivîl kir. Van kiryarên xwe yên hovane heta roja îro jî didomîne. Lê cîhan heta niha jî li hember van kiryaran bê deng e. piştî ku Efîn hat dagirkirin û pêde 22 kesên sivîl windane, 25 hatine qetilkirin, 35 kes hatine girtin, 4 kes hatine birîndar kirin û 180 kes jî hatine revandin.***



Dewleta Tirk ya dagirker ji dema dagirkeriya Efrînê ya di 18'ê Adarê û vir ve gelek rêbazên qirkirin û talankirinên li ser niştecihên Efrînê pêk anîn. Tirkiyê û komên çeteyên girêdayî wê bi polîtîkayên qirkirina gelê Efrînê gelek sivîlên Efrînê qetil kirin, revandin, îşkence kirin û koçber kirin. Ji roja ku Efrîn hat dagirkirin û vir ve kiryar û polîtîkayên binpêkirinên mafên mirovan li Efrînê didomin ku gihiştiye asta herî jor û ev yek bi belgeyan ji nava Efrînê bi riya çavkaniyên taybet tên .bidestxistin û eşkere kirin
Artêşa Tirk a dagirker û komên çeteyên girêdayî wê ku di 20'ê Çile de bi piştgiriya hêzên navneteweyî li Efrînê dest bi sûcên li dijî mafê mirovan ên weke talan, dizî, kuştin, îşkence, revandin û tecawizê kirin, hê jî van kiryarên xwe berdewam dikin. Ligel belge, wêne û dîmenên heyî jî, di serî de Neteweyên Yekbûyî (NY), hemû sazî û dezgehên herêmî û navneteweyî ji .bo Efrînê rola sê meymûnan lîstin
Di vê dosyeya ku çend beşên qetil kirina sivîlan, birîndar û işkence kirin, revandin û girtin bi belge kiryarên Tirkiyê li Efrîn radixe ber çavan. Tirkiye îdîa dike ku Efrîn ji terorê rizgarkiriye û bajar di aramiyê deye, lê her roj zilmê li sivîlan dike û zilm di asta herî jor deye. Rojane kuştin û girtin ji aliyê leşker û çeteyên dagirker yên Tirk ve tên kirin ku ev yek têrê nake, çavkaniyên ji nava Efrînê jî eşkere dikin ku komên çete yên girêdayî Tirkiyê bi pereyan sivîlên Efrînê berdidin. Di heman demê de gelek welatiyên Efrînê nizanîn ciwanên wan li ku derê ne û di kîjan rewşê .dene
Niha rêxistinên mafê mirovan û medya bi tu awayî nikarin ji nava Efrîn agahî bi dest bixin. Ji ber ku di dema dagirkerina Efrînê de qedexeya derketina derve hat îlankirin û Tirkiye naxwaze yek dîmenek ji bajar derkeve. Tirkiye û komên wê yên çete ji bo ragihandinê kontrol bike buro li hemû heremên di bin serweriya xwe de li Cerablus, Ezaz, El Rayî, El Bab û Efrînê vekirin. Ev hejmara ku tê zanîn ji hejmara rast pir kêmtire. Rêxistinên mafê mirovan ku binpêkirinên Tirkiyê bi belge dikin, bang li civaka navdewletî dikin ku ev yek zû were rawestandin, lê heta niha ji ber ku cîhanê çavê xwe ji zilma Tirkiyê re girtiye, ev kiryar derdikevin asta herî jor û hîna jî xeteriya kuştinê li ser gelê .Efrînê heye
Heta niha li gor agahiyên hatine piştraskirin li Efrînê piştî ku hat dagirkirin 22 kesên sivîl windane, 25 hatine qetilkirin, 35 kes hatine girtin, 4 kes hatine birîndar kirin û 180 kes jî hatine revandin…***Erdogan ALTAN /MA***



## Dergûşa Mirovahiyê Dişewite

Mihemed ŞAHÎN

Gelo kîjan wijdan, kîjan edalet, kîjan exlaq, kîjan nirx û rûmetên mirovahiyê, kîjan xweda û bawermendî destûra dijminahiya xwezayê dide? An destûra îxaneta li dergûşa dayikê dide?
Bi destpêka germahiya havînê ve ji çarhêlên Kurdistanê duxana ku reşbûna xwe ji hişmendiya dagirkeran digre radibe. Daristanên Efrînê, Dêrsimê, Amedê Colemêrgê, Şirnexê, Bedlîsê, Wanê, Mêrdînê, Çolemêrgê, Bradostê ev çend roje bênavber dişewitin.
Dergûşa mirovahiyê û jêdera şaristaniyan a ku bi bereketa xwe, bi dewlemendiya xwe, bi xweşbîniya xwe di hemêza xwe de mirovahî xwedî kiriye careke din bi destê artêşa tirk û çeteyên hevkarên wê li ber çavên her kesî tê şewitandin. Hemû sazî, dezgeh, rayedar û civakên Tirkiyê û cîhanê yên qaşo xwezaparêz û xwezahez hemû bûne kor, ker û lal.
Bê guman ev ker, kor û lalî ya çanda dewletê ya 5 hezar salane. Bi çanda dewletbûnê re di vê erdnîgariyê de bi qasê ku civak bi qirkirinê rûbirû mane bi ewqasî xweza jî bi qirkirinê re rûbirû maye. 5 hezar sale Kurdistan qada şer e û xwezaya Kurdistanê dişewite.
Bi taybet di dawiya serdema Osmaniyan de piştî mudaxaleya jiyana xweser a Kurdan bi destpêka serhildana Mîr Evdrehamanê Babanî yê 1806 an virve 212 sale Kurd bê navber di serhildanê de ne. Di encama hemû serhildanan de civaka Kurd û xwezaya Kurdistanê bi qirkirinên dijwar re rûbirû mane. Bi qasê ku bi civaka Kurd re dijminahî kirine ewqasî bi xwezaya Kurdistanê re jî dijminahî kirine. Bi kurtasî ev 212 sale bê navber civaka Kurd û xwezaya Kurdistanê bi qirkirina desthilatdariya Tirk re rûbirû ye.

Piştî qirkirina hezar salan îro li çiyayên Kurdistanê tenê dara Mazî ma ye. Dara Mazî dareke qedîm e. Bi qasê civaka kurd serhildêr û berxwedêr e. Her sal hetanî kokê tê şewitandin lê bi hatina biharê re bi inyad careke din aj dide, şîn dibe û dibêje ez livirim hûn nekarin kok û rehên min ji vî axê rabikin. Ji bo wê ye bi qasê ku li civaka Kurd bi hêrsin ewqasî li dara mazî jî bi hêrsin.
Destana mirovahiyê yekemîn "Gilgamêş" bi dorfirehî qala daristana Kurdistanê ya bê hempa dike, pirtûka pîroz a Cuhiya Tewrad ji erdnîgariya Kurdistanê re dibêje "welatê bihuşt". Dîroknasê gerok ê Tirk Ewliya Çelebî di pirtûka xwe ya bi navê "Seyahatneme" yê de ji bo vegotina daristana Kurdistanê dibêje; "Dema ku hûn ji Amedê herin Mêrdînê hûn dikarin di bin siya daran de hetanî Mêrdînê herin qet roj li we nede, heke hûn di ser daran re herin, hûn dikarin ji Amedê hetanî Mêrdînê ji dar derbasê dar bibin ku qet lîngên we bi erdê nebin". Lê mixabin niha mirov ji Amede diçe Mêrdînê di rêde qet dar nabîne.
Hevokên Ewliya Çelebî yên ku tenê 350 sal berê hatine nivîsin têrî vegotina asata qirkirina xwezaya Kurdistanê dikin. Heke vê çanda dewletê ya qirker di 350 salî de navbera Amed û Mêrdînê anîbe vî halî di 5 hezar salî de Kurdistan û Mezopotamya aniye çi halî êdî hûn texmîn bikin.
Zerdeştê Kal 2600 sal berê di çanda dewletê ya xof û qirker de ev roj dîtibûn. Hewl dabû pêşî li qirkirinên vî çandê bigre û xwezaya Kurdistanê biparêze. 2600 sal berê birîna darê û kuştina sewalan qedexe kiribû. Îro careke din neviyên Zerdeştê Kal hewl didin pêşî li vê çanda hov a qirker bigrin.
Îro têkoşîna ku di bin pêşengiya neviyên Zerdeştê Kal de ji bo mirovahiyê tê dayîn gelek watedar û pîroz e. Têkoşîna serwerkirina wijdan û edaletê ya herî bi rûmet û herî rewa ye. Têkoşîna rizgariya mirovahiyê û xwezayê ye.

## Êrîşa li ser Şengalê li dijî jinan pêk hat



Çalakvana TJA Ayşe Gokkan, diyar kir ku êrîşa DAIŞ'ê ya di 3'yê Tebaxa 2014'an de li dijî Şengalê pêk hat, li hemberî berxwedana jinan peyamek bû û got: "Êrîş û polîtîkayên 5 hezar sal ên li ser jinan, bi fermana 73'yemîn a li ser gelê Êzidî, carek din hat ".dubarekirin
Êzidiyên di serdema Împaratoriya Osmaniyan û Serokê Dewletê yê Iraqê Saddam Huseyîn de rastî komkujiyên bêhejmar hatin, di 3'yê Tebaxa 2014'an de rastî komkujiya 73'yan hatin. Piştî DAIŞ'ê di 10'ê Hezîrana 2014'an de Mûsil dagir kir û şûnde di 15'ê Hezîrana 2014'an de jî Telafer dagir kir. DAIŞ'ê piştî dagirkirina van her du bajaran, vê carê jî berê xwe Şengalê û di 3'yê Tebaxa 2014'an de gelê Êzidî di komkujiyê re .derbas kir
Endama Platforma Têkoşîna Ji Bo Jinên Êzidî yên bi Darê Zorê Hatin Desteserkirin û Çalakvana Tevgera Jinên Azad (TJA) Ayşe Gokkan, di 4'emîn salvegera ferman 73'yan a li dijî Êzidiyan de, têkoşîna jinên .Êzidî ya li dijî DAIŞ'ê nirxand

### OCALAN HIŞYAR KIRIBÛ

Gokkan, diyar kir ku ligel ku Şengal dibin parastina hikûmeta Iraqê de bû jî, DAIŞ'ê bi çekên li Mûsilê bi dest xistin, êrîşî Şengalê kirin û wiha axivî: "Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hişyar kiribû. Gotibû dê êrîşa yekemîn li dijî Şengalê be. Ji ber ku Şengal ne dijminê kesekê bû û şerê kesekê nekirbû, gelê herî lewqa dihat dîtin û bi vî awayî rastî êrîşan hat. Hêzên navneteweyî dizanîbûn DAIŞ dê êrîşî Şengalê bike, lê ligel vê yekê jî bêdeng man. Ocalan di şert û mercên girtîgehê de jî ev yek dizanî. Gelo çawa dibe ku hêzên ?navneteweyî nizanîbûn

### DAIŞ'Ê HEWL DA HÊZA XWE NÎŞAN BIDE

Gokkan, anî ziman ku êrîşa DAIŞ'ê ya li ser Şengalê şerma hemû welatên cîhanê ye û wiha got: "Hikûmeta Iraqê û hêzên pêşmergeyên PDK'ê di dema êrîşê de, dest ji Şengalê berdan. DAIŞ'ê ji van polîtîkayên PDK û hikûmeta Iraqê hêz girtin û xwest bi êrîşa li ser Şengalê hêza xwe piştrast bike. Di vê êrîşa DAIŞ'ê de, bi taybetî êrîşên li ser jinan carek din derketin holê. DAIŞ'ê li Şengalê herî zêde êrîşî jinan kirin. Bi vê yekê xwestin peyam bidin cîhanê. Vê rastiyê stratejiya şerê DAIŞ'ê ".derxist holê

### PEYAMA LI DIJÎ BERXWEDANA JINÊ BÛ

Gokkan, da zanîn ku di hemû şerên cîhanê yên tên li darxistin de, jin weke 'xenîmet' tên dîtin û wiha bilêv kir: "Mînakên vê yekê di şerên cîhanê yê yekemîn û duyemîn de jî hene. Di êrîşa DAIŞ'ê ya li ser Şengalê de peyama di sedsala 21'emîn de tiştên bên jiyîn hebûn. Êrîşa DAIŞ'ê nayê wateya mexdûrbûna jinê. Ji ber ku berxwedan û têkoşînek mezin a jinan heye. DAIŞ'ê hemû polîtîkayên 5 hezar sal ên li ser jinan, li Şengalê pêk anîn. Jin li bazaran hatin firotin, rastî îşkenceyên pir xerab û tecawizê hatin û zarokên wan ji wan stand. Ev polîtîkayên 5 hezar salin li ser jinan tên meşandine. Ji ber vê, peyama li vê derê ji bo hemû jinên cîhanê hat dayîn ne ji rêzê bû. Bi vê peyam dan berxwedana jinan."…***MA***

## Ji bo Şengalê li 20 navendan wê meş bên kirin

Di salvegera çaremîn a Qirkirina Şengalê de, Kurdistanî wê li 20 bajarên Elmanyayê çalakiyên .protestoyî li dar bixin
Bi wesîleya salvegera 4. a Qirkirina Şengalê wê li qada navneteweyî .çalakî bên lidarxistin
Hevserokên NAV-DEM'ê daxuyaniyek dan û ji bo êrîşên çeteyên DAÎŞ'ê yên 3'ê Tebaxa 2014'an ên li Şengalê got, "Fermana ".73'an
NAV-DEM'ê ev komkujiya ku li dijî mirovahiyê hatiye kirin şermezar kir û şervanên ku ji bo azadiyê canê xwe dan bi bîr anî. Di daxuyaniyê de hate gotin, "Ev komkujî ne tenê li dijî Kurdan, ne tenê li dijî jinên Kurd ên Êzidî hatiye kirin. Komkujî li dijî mirovahiyê, bi taybetî li hemberî ".hemû jinan hatiye kirin
NAV-DEM'ê diyar kir, li Şengalê di şexsê jinan de civak hatiye qirkirin û wiha dewam kir: "Ji ber vê yekê, hemû jinên cîhanê divê li dijî rêxistinên faşîst ên mîna DAÎŞ'ê bi rengekî hevpar têbikoşin û helwesteke hevpar nîşan bidin. Ji bo vê jî pêwîstî bi rêxistinbûna xurt, sekna bi biryar û ".geşkirina têkoşîna radîkal heye
NAV-DEM'ê ji bo êrîşên qirkirinê yên sala 2014'an got, "Yê ku plana vê komkujiyê amade kir dewleta AKP'ê ya mêtinger faşîst e. Yê ku bingeh ji êrîşê re amade ".kir, zîhniyeta PDK'ê ye
NAV-DEM'ê Êzidiyên hatin kuştin, hatin revandin, destdirêjî û destavêtin li wan hate kirin û li bazaran mîna koleyan hatin firotin bi bîr xist û wiha dewam kir: "Cîhanê tenê li vê êş û feryadê temaşe kir û xwe kerr kir. HPG/YJA Star û YPG/YPJ bi hawara civaka ku li ".ber tinebûnê bû beziyan
Hevserokatiya NAV-DEM'ê da xuyakirin ku piştî 4 salan civaka Êzidî li cih û warên xwe bûye



xwedî hêza xwerêvebirin û parastinê û işaret bi êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk ên li .Başûrê Kurdistanê kir
NAV-DEM'ê diyar kir ku li dijî êrîşên dagirkerî û qirkirinê wê li gelemperiya Elmanya û Ewropayê roja 3'ê Tebaxê çalakî bên lidarxistin û ji bo çalakiyan banga .tevlîbûnê kir